***Kongra Netewiya Kurdistan***
*Kurdistan National Congress*
***Congrès National du Kurdistan***

KNK

***Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84 fax: 00 32 2 647 68 49***
***Homepage:*** www.kongrakurdistan.com ***e-mail:*** knk@kongrakurdistan.com

# Ji bo raya giştî

Bruxelles, 31.07.2003

Kongra Netewiya Kurdistan, qanûna poşmaniyê ya ku di parlamenta Tirkiyê de hat pejirandinê, ku bi armanca têkbirina tekoşîna azadî û demokrasiya a Gelê Kurdistanê hatiye amadekirin, protesto û mehkum dike. Ev qanûn jî, wek qanûnên din, bêguman ê bê encam bimîne.

Dewleta Tirk naxwaze bibîne û qebûl bike ku ew siyaseta tunekirin û poşmankirina Gelê Kurd, ji ber tekoşîna Gelê Kurd êdî bê wate û bê encam maye. Di vê siyasetê de îsrar, ji bo gelê Turkiyê, li hemû aliyan de têkçûyîneke mezin e.

Ji bo aştî û çareseriyek demokratî çêbe, Gelê Kurd eva 4 sale derfet û fedekariyên pir mezin pêk anî. Lê belê dewlet bi awayekî erênî ev firseta kar neanî, ev dem û derfetên dîrokî ziyan kir. Naha jî hewl dide ku vê siyaseta xwe ya xeter, ber bi şerekî mezin berfireh bike.

Kongra Netewiya Kurdistan ji gelê me re bang dike, li hember vê siyaseta Tirkiya ku daxwaze Gelê Kurdistanê poşman û tunebike, pêwîste bi awayekî demokratîk di hemû warên jiyanê de çalaki bê berdewamkirin û siyaseta Dewleta Tirk bê mehkum kirin.

Konseya Rêveber